



Efrîn di bin dagîrkeriyê de (98):

Şewtandina daristanan, dijîkirina li ser sivîlan, vêrgiyên berdeyam



Hemî kiryarên ku, milîseyên çekdar ên terorîst ên di bin ala "artêşa niştîmanî ya Sûrî" de, û bi (hikometa Sûrî ya demkî) ve girêdayî, ya ji aliyê Hemahengiya Sûrî - ya Ixwanî ve hatiye çêkirin; Bi rengê rêbazkirî û pîvandî, û bi serpereştiyek yekser ji istîxbaratên (mît) Turkiyê ve, têne kirin. Û yê ku, ji bilî wê bibêje xewnan dibîne, û ji rastî û heyînê ve, pir dûr e.

Armanca sereke ji van binpêkirin û tewanên curbecur, çêkirina guhertineke demografî li herêma Efrînê ye. Û di hefta borî de, me hin binpêkirin şopandin:

-Milîseya "Lîwa'i Elsemerqend" ya ku, gundê "Dela" - navça Mabeta destlat dike, li 4.7.2020an dijayetiya ser hinek hemwelatîyên wî gundî kir, ji ber ku, razînebûn milîse darên daristanên derdora gund qutbikin. Û ew jî ev in: Temenmezin Ebid Elkerîm Hemadê /65/sal, Rizgar Ehmed Umer, Mihemed Ehmed Umer, Mihemed Ebid Elkerîm, Mihemed Elî Cayê û kurê wî Şêro, Rêzan Ebid Elkerîm Hemadê, Nîzar Şukrî Çîlo, û Ehmed Ezîz û kurê wî Xalid. Û ji ber lêdan û îşkencê, temenmezin Ebid Elkerîm Hemadê bi nexweşxana Efrînê hate guhestin.

-Li siba 5.7.2020an, milîsyeye çekdar agir bi rûbereke fere ji çiyayê gundê Şêx Bila - navça Reco xist, û daristanên ihracê yên xwezayî hatin şewitandin.

-Piştî ku, milîseya "Firqit Elhemzat" a ku, gundê "Firêriyê" - navça Cindirêsê destlat dike, vêrgî ji xelkê gund xwest û wan jî neda; Devavêtin di nav herdu aliyan de çêbûn, û çekdaran qurşînên jîndar yekser avêtin xelkê. Di encamê de, li siba 5.7.2020an /3/hemwelatî birîndar bûn, û li roja din çekdaran dîsa vêrgî ji xelkê xwestin, û careke din gundiyan daxwaza wan redkirin. Di dû re, çekdaran mal bi şêwakî fere dane lêgerînkirin, û /1/K.G zêr û /1500/\$ ji malbata "Hesîdê" ya ji pêkhatiya Ereba dizîn, û ta amedekirina raporê, hîn rewşa gund ne li hev e.

-Ji bo zextê li ser nişteciyên Kurd li herêma Efrînê, û têvedana wan bi aliyê berdana gundê wan û penaberiyê ve, û weke berdeyamî ji tûşbûna gundê "Kaxrê" - navça Mabeta, ya li ser destê milîseya "Lîwa'i Elsultan Silêman Şah - Elemşat" re; Hemwelatî "Fatme ji gundê Xalta - navça Cindirêsê û li gundê Kaxrê mêrkirî" ji mal hate qewtandin - piştî ku, /1000/\$ neda -, ji ber wê jî neçar bû ku, bi xwediyên xwe re, li gundê Xalta rûne. Û piştî danûstandinê bi "Elemşat" re /800/\$ da, da ku, mala xwe vegeîne.

-Li 2.6.2020an, hemwelatî "Elî Xelîl Xelîl" ji bajaroka Celemê - navça Cindirêsê, ji aliyê milîseya "Feyleq Elşam" ve hate girtin, û ta niha çarenûsa wî ne xuyaye.

-Di siya fewdalîzim û serberdayetiye de, li 5.7.2020an, makînak li taxa Mehmûdiyê - çateriya nanopêjgeha otomatîk - li hundir bajarê Efrînê hate teqandin, û di encamê de, du kes hatin kuştin û hin din birîndar bûn.

-Piştî girtina ciwan "Ebid Elrehman Îbiş Biko /1982/Z" ji gundê "Kurzêlê" Şêrewa gelek caran, li ser destê milîseya "Firqit Elhemzat" bi behaneyê ku, du birayên wî di nav refên Yekîneyên Parastina Gel de bûn hate girtin. Û pişt re, bi gelek nexweşiyên ket, û bi ser wê de, jiyana xwe ji dest da. Divê were zanîn ku, dilovanber di xwaringeheke bi çûk de, li Efrînê kar dikir.

-Ciwan "Menan Ebdo Îbiş /19/sal" ji navça Cindirêsê - taxa jêrin, ji 15/8/2019an ve - bi behaneyê danûstandina wî bi Yekîneyên Parastina Gel re - hatiye girtin, û bi zorê hatiye veşartin û ta niha çarenûsa wî ne zelal e.

Çiqas dagîrkeriya Turkiyê û milîseyên terorîst bi hemî alav û şeweyan hewil bidin ku, ji vîna xelkê me yê berxwedêr li Efrînê kêm bikin; Ew nikanin hêz û rîjdariya xelkê ji berevanî û pêgiriya bi erdê bav û kalên wan re daxînîn, û ewê herdem ji daxwaza derxistina Turkiyê ji hemî axên Sûriyê yê dagîrkiriyê, û dandina zirarên ku, dagîrkeriyê gîhandiye hemwelatiyan re, rikdar bin.

12.07.2020an

Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn
Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

Wêne:

- Çiyayê gundê Şêx Bila - navça Reco.
- Dilovanberê ciwan Ebid Elrehman Îbiş Biko.
- Girtiyê ciwan Menan Ebdo Îbiş.

Malpera Fermî: www.yek-dem.com , Êmail: info@yek-dem.com